handicap international
humanity & inclusion

NOW! Nicht Ohne das Wir

6

# Serlêdana Berjewendiyan û sitandina Alîkariyan

Agahiyên ji bo penaberên Astengdar û xizmên wan ji projeya Empowerment Now û Koma NOW! Nicht Ohne das Wir



# Li Almaniyayê kîjan mafên min hene?

Gelek penaberên Astengdar û xizmên wan dema digihêjin Almanyayê rastî zehmetiyeke mezin tên: Çawa piştgirî û alîkariyê distînin? Gelek pirsên wan li ser sîstema alîkariyê li Almanyayê hene. Ew jî dixwazin bizanin ka mafên wan ji bo piştevanî û alîkarîyê çi ne. Lê gelek caran ew nikarin ti agahiyek li ser vê yekê bi zimanê xwe bibînin.

Ji ber vê yekê niha şeş broşurên xwedî agahî bi neh zimanan hene. Em ê we li ser mafên we yên piştgirî û alîkariyê cûrbecûr agahdar bikin. Û em bersivê pirsên li ser sîstema alîkariyê ya li Almanyayê didin. “Dema ku ez hatim Almanyayê min dixwest kîjan agahiyê bi dest bixim?” Dema ku me agahî dinivîsand ev pirs ji bo me girîng bû.

## Tu ne bi tenê yî!

Li Almanyayê gelek navendên şêwirmendiyê hene. Tu dikarî li vir şîretan bistînî. Her dem piştgirî bistîne!

**Çima ez biçim navendeke şêwirmendiyê?**
Navendên şêwirmendiyê dê di serlêdana te ya ji bo xizmetên piştevaniyê û di dema redkirina serlêdana te de alîkariya te bikin. Piştî şêwrekê tu ê hewcedarî û derfetên xwe baştir fêm bikî û xizmetên piştevaniyê yên rast bistînî.

*Navendên şêwirmendiyê*
Şîreta Hevpişka Serbixwe ya Pêvek (Ergänzende unabhängige Teilhabeberatung, EUTB)

Navendên Şêwirmendiya Koçberiyê yên Komeleyên Refahê

Di pirsên te yên li ser lênêrîna tenduristî, rehabîlîtasyona bijîjkî û lênêrînê de, Şêwirmendiya Nexweşên Serbixwe li Almanya (Unabhängige Patientenberatung Deutschland, UPD) ji te re bibe alîkar.

Her wiha tu dikarî bi komeleyên astengdariyê, bi Nivîsgeha refaha civakî (Sozialamt), bi Dezgeha karê (Agentur für Arbeit) an jî bi Nivîsgeha entegrasyonê (Integrationsamt) ra bikevî têkiliyê. Gelek caran ew pir nêzî te ne.

Li gelek eyaletên federal hîn bêhtir xizmetên şêwirmendiyê hene. Ya herî baş ew e ku tu agahdarî li cihê rûniştinê xwe bistînî.

# Serlêdan tije bikin û berjewendiyan bistînin

Xizmetên piştgiriyê yên herî girîng ên ji bo kesên astengdar çi ne? Ji bo wergirtina xizmetan an berjewendiyan pêwîstî bi çi destûra rûniştinê heye? Ji bo ku hûn ji bo berjewendiyê serlêdan tije bikin, divê hûn çi hewcedariyên xwe bicîh bînin? Hûn dikarin li ku derê serlêdana berjewendiyê tije bikin? Em ê li ser we agahdarî didin,

- kî çi xizmetekê distîne,
- tu çawa ji bo berjewendiyê serlêdan dikî,
- li ku derê tu ji bo berjewendiyê serlêdan dikî,
- û dema ku tu ji bo berjewendiyekê serlêdanê dikî, divê tu çi bifikirî.

# Qanûna Alîkariya Penaberan kîjan xizmetan çalak dike?

Ji bo dabînkirina hewcedariyên bingehîn ên jiyana rojane, penaxwazan li Almanyayê li gorî Qanûna Alîkariyên Penaberan (AsylbLG) alîkariyan distînin. Xizmet ev in:

- Alîkariyên xwarin, cil û berg û stargeh, lênihêrîna tenduristî, kelûmelên malê û xerckirin û tiştên pêdivî ya malê (pêdiviyên pêwîst)
- Alîkariyên diravî ji bo dabînkirina hewcedariyên kesane yên jiyana rojane (hewceyên kesane yên pêwîst)
- Xizmetên dema nexweşî, ducanî û jidayikbûnê

Alikariyên ku tu di dema pêvajoya penaberiyê de distînî ji bo lêçûnên jiyanê û lênihêrîna tenduristiyê ne.

## Kî Allîkarî distîne?

Penaber û kesên xwedî destûra Duldungê

## Li ku derê dikarim serlêdan bikim?

Ev yek bi dewleta federal ve girêdayî ye, wekî mînak li Nivîsgeha Navçeyê (Landratsamt), li Rêveberiya Bajêr, li Nivîsgeha Refaha Civakî (Sozialamt). Ji navendeke şêwirmendiyê ya li herêma xwe bipirsin ka kîjan rayedar ji we re berpirsiyar e.

## Divê ez kîjan şert û mercan bicih bînim?

- Tu serlêdana penaberiyê an jî daxwaza penaberiyê kiriye.
- Li gorî Qanûna Penaberiyê, tu delîla hatina te an jî destûra rûniştinê ya demkî heye.
- Tu li Almanyayê dijî.
- Tu nikarî bi sermayeyên xwe an dahata xwe bijî.

**Nîşe**

Mafê penaxwazan heye ku xizmetên bi navê analog/berdêl bistînin, kesên xwedî statuyê Duldungê jî xwedî vê mafê ne. Divê bi dirêjahiya 36 mehan li Almanyayê bijî. “Xizmetên Analog” xizmetên ku bi cure û mîqdar wekî alîkariya civakî ne.

# Alîkariya hemwelatiyê (Bürgergeld) û Alîkariya Civakî (Sozialhilfe)

Alîkariya hemwelatiyê û alîkariya civakî ji bo kesên ku têra debara xwe nakin, piştgiriya aborî ji aliyê dewletê ve ye. Cûdahiya herî girîng di navbera alikariya hemwelatiyê û alîkariya civakî de şiyana karkirinê ye. Heke tu bikaribî kar bikî, tu alîkariya hemwelatiyê distînî. Heke tu nikarî bixebitî tu alîkariya civakî distînî.

## Serlêdana ji bo Al,ikariya hemwelatiye: Tu dikarî bixebitî.

**Ki alîkariyê distîne?**

- Penaberên naskirî, yên xwedî mafê penaberiyê û mafê parastina pêvek
- Kesên ku destûra rûniştinê hene li gorî xala 24-ê ya qanûna rûniştinê

**Li ku derê dikarim serlêdanê tije bikim?**
Navenda Kar (Jobcenter)

**Divê ex kîjan şert û mercan bicih bînim?**

- Tu destûra rûniştinê an jî sertîfîkaya Fiksiyonê heye.
- Tu dikarî rojê herî kêm sê saetan bixebitî. Tu jî hewceyê alîkariya aborî yî.
- Tu nikarî bixebitî lê tu bi kesekî re dijî ku karibe bixebite.
- Tu bi kêmanî 15 salî yî û hêj ne di emrê teqawîtbûnê da yî.

Di vê rewşê de, divê tu ji bo wergirtina alîkariya aborî serlêdana alîkariya hemwelatiyê tije bikî.

## Serlêdana alîkariya civakî: Tu nikarî bixebitî û ne di temenê teqawidbûnê de yî.

**Kî alîkariye distîne?**

- Penaberên naskirî, yên xwedî mafê penaberiyê û mafê parastina pêvek
- Kesên xwedî destûra rûniştinê li gorî xala 24 ya qanûna rûniştinê
- Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê ku ji bo dirêjahiya 36 mehan li Almanyayê dijîn û li gorî xala 2 ya Qanûna Alîkariyên Penaberan mafê wan ê alîkariyên wekhev hene.

**Li ku derê dikarim serlêdan tije bikim?**
Nivîsgeha Refaha Civakî

**Divê ez kîjan şert û mercan bicih bînim?**

- Tu destûra rûniştinê an jî sertîfîkaya Fiksiyonê heye.
- Tu nikarî bixebitî (piştgiriya lêçûnên jiyanê) an tu gihîştiye temenê teqawidbûnê (Ewlekariya bingehîn).

# Bîmeya tenduristiyê

Bîmeya tenduristiyê ya qanûnî sîstemek bîmeyê ye. Ew ji hêla dewletê ve tê rêve kirin û garantiya lênihêrîna bijîjkî ya bingehîn dide mirovan.

## Agahdarî ji bo penaxwazan û kesên xwedî destûra Duldungê

- Penaxwazan xwediyê bîmeya tenduristiyê ya yasayî nîne. Li şûna wê, hûn ê li gorî Qanûna Alîkariyên Penaberan alîkarî distînin.
- Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê ku ji 36 mehan zêdetir e li Almanyayê ne, li seranserê Almanyayê karta tenduristiyê distînin. Nivîsgeha alîkariya civakî ji qeydkirinê berpirsiyar e.
- Piştî pêvajoyeka serketî ya penaberiyê, bîmeya tenduristiyê ya qanûnî (an jî taybet) mecbûrî ye!

## Kî Alîkariyê distîne?

- Penaberên naskirî, yên xwedî mafê penaberiyê û mafê parastina pêvek
- Kesên ku destûra rûniştinê hene li gorî xala 24-ê ya qanûna rûniştinê

## Li ku derê dikarim serlêdanê tije bikim?

Navenda Kar, Nivîsgeha Refaha Civakî an jî Şirketa bîmeya tenduristiyê

## Divê ez kîjan şert û mercan bicih bînim?

- Heke tu **ji dewletê piştgiri** bistînî, tu serlêdana endametiya şirketeka bîmeya tenduristiyê (Krankenkasse) tije dikî. Sertîfîkaya endametiya xwe bişîne navenda kar an jî nivîsgeha refaha civakî. Her weha tu dikarî ji bo endametiya şirketa bîmeya tenduristiyê li navenda kar an nivîsgeha refaha civakî serlêdan tije bikî.
- Heke tu **bixebitî**, tu bîmeya tenduristiya xwe bi şirketeka bîmeya tenduristiyê bi hilbijartina xwe re digirî.

Li vir tu dikari rêzek ji Bîmeyên Tenduristiyê bibînî.

Bîmeya malbatê jî heye. Hevjîn û zarokên karkeran dikarin di bîmeya tenduristiyê ya dêûbavê karker de bin. Ew belaş e.

# Nasnameya Astengdariyên giran

## Nasnameya Astengdariyên giran (Schwerbehindertenausweis)

Li Almanyayê, kesên ku astengdariya wan a giran tê naskirin, karta nasnameya astengdariyên giran distînin. Ew delîla asta astengdariya we ye. Karta nasnameyê ji mirovan re daşikandinan pêşkêşî dike, ku jê re tê gotin xizmeta dezavantajê. Di nav wan de, wekî mînak, daşikandina bilîtên sînema û şanoyê, bilîtên veguhestina giştî ya herêmî û her weha li ser xercên weşanê hene. Bi vî nasnameyê hûn avantajên bacê distînin.

## Kî Alîkariyê distîne?

- Penaberên naskirî, yên xwedî mafê penaberiyê û mafê parastina pêvek
- Kesên xwedî destûra rûniştinê li gorî xala 24 ya qanûna rûniştinê
- Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê



## Li ku derê dikarim serlêdanê tije bikim?

Ofîsa teqawidiyê

## Divê ez kîjan şert û mercan bicih bînim?

- Tu divê herî kêm ji bo şeş mehan asteng bî.
- Tu ji bo diyarkirina asta astengdariya xwe ji berê de serîlêdanek pêşkêşî ofîsa teqawidiyê kiriye. Dûv re tu agahdariya destnîşankirina asta astengdariya xwe bistînî.
- Heke asta te ya astengdariyê 30 an jî zêdetir be, tu wekî astengdar bêye naskirin.
- Ji bo ku tu kerta nasnameyê ya kesek astengdar a giran bistînî, hewceyê asta astengdariya te ya 50 an zêdetir be.

Tu serîlêdana xwe ya ji bo nasnameya kesê astengdarê giran pêşkêşî ofîsa teqawidiyê ya li herêma xwe dikî. Ji bo vê yekê hewcedariya te bi Daxuyaniya biryardanê ye. Tu dikarî di vîdyoyê de bêtir agahdarî bibînî: Ez çawa dikarim li Almanyayê astengdariyek bidim naskirin?.

# Alîkariya lênêrînê

Alîkariya lênêrînê beşek ji alîkariya civakî ye li Almanya. Ew feydeyek civakî ye ku bi wê dewlet piştgirî dide kesên hewcedarê lênêrînê ku bi xwe nikarin lênêrînê ji xwe re peyda bikin. Alîkariya lênêrînê, wekî mînak, lênêrîna malê û derveyî nexweşxanê û alîkariyên lênêrînê dihewîne.

## Kî Alîkariyê distîne?

- Penaberên naskirî, yên xwedî mafê penaberiyê û mafê parastina pêvek
- Kesên xwedî destûra rûniştinê li gorî xala 24-ê ya qanûna rûniştinê
- Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê ku ji bo 36 mehan li Almanyayê ne, dikarin alîkariya lênêrînê wekî **Xizmetên bijartî (Ermessensleistung)** bistînin.

**Xizmeta bijart çi ye?**
Heke ji aliyê qanûnî ve mafê te yê berjewendiyê tinebe, wê rayedar biryarê bide ka wê feydeya ku te xwestiye bide yan na. Girîng: Divê tu daxwzê xizmetê bikî.

**Nîşe**

Ma kî mafê alîkariya lênêrînê nîne? Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê ku hê jî 36 meh nîne li Almanyayê ne. Lêbelê, nivîsgeha refaha civakî dikare alîkariyan bipejirîne (Xala 6 Paragrafa 1 ya Qanûna Alîkariyên Penaberan) heke ji bo dabînkirina tenduristiyê an dabînkirina hewcedariyên taybetî yên zarokan hewce be.

## Li ku derê dikarim serlêdanê tije bikim?

Nivîsgeha Refaha Civakî

## Divê ez kîjan şert û mercan bicih bînim?

- Ji ber nexweşiyek an astengdariyek di jiyana rojane de hewcedariya te bi alîkariya domdar heye.

Tu forma serîlêdanê û daxwaznameyeke nefermî ji bo naskirina hewcedariya te ya lênêrînê pêşkêşî nivîsgeha refaha civakî dikî. Paşê daîreya refaha civakî nirxandineke lênêrînê dike. Nirxandineke bi vî rengî asta serxwebûna kesê hewcedarê lênêrînê di şeş warên jiyanê de diyar dike. Dûv re asta lênihêrîna te tê hesibandin (asta lênihêrînê 1 heya 5). Kesê ku hewcedarê lênêrînê ye li gorî asta lênêrînê, alîkariya lênêrînê distîne.

# Serlêdana ji bo berjewendiyen tevlêbûnê

Xizmetên Tevlêbûne (alîkariya entegrasyonê, Eingliederungs-hilfe), tedbîrên piştgiriyê yên ji bo kesên astengdar in. Armanca wan ew e ku tevlêbûna wekhev a jiyana civakî pêk bînin. Xizmetên tevlêbûnê, wekî mînak, xizmetên alîkariyê, alavên alîkarî û alavên çareseriyê ne.

## Kî alîkariyê distîne?

- Penaberên naskirî, yên xwedî mafê penaberiyê û mafê parastina pêvek
- Kesên xwedî destûra rûniştinê li gorî xala 24-ê ya qanûna rûniştinê
- Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê ku ji bo 36 mehan e li Almanyayê dijîn, dikarin alîkariyên entegrasyonê wekî xizmetên bijartî bistînin.

**Nîşe**

Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê ku hê jî 36 meh nîne li Almanyayê ne, mafê wan ê alîkarîya entegrasyonê tune. Desthilat dikare xizmetên arîkariya entegrasyonê bipejirîne, heke ew ji hêla bijîşkî ve hewce bin an jî ji bo misogerkirina tenduristiyê bibin alîkar.

**Nîşe**

Rêzikên taybetî ji bo zarok û ciwanan derbas dibin.

## Li ku derê dikarim serlêdanê tije bikim?

Pêşkêşvanên xizmetên rehabîlîtasyonê (wekî mînak nivîsgeha refaha civakî û şirketa bîmeya tenduristiyê)

## Divê ez kîjan şert û mercan bicih bînim?

- Tu divê herî kêm ji bo şeş mehan asteng bî.
- Astengdariyek te heye û hewcedariya te, wekî mînak, bi alavên arîkarî an arîkariyê ye.

Li gorî cureya xizmetê, tu serîlêdanek nefermî pêşkêşî pêşkêş-kerê rehabîlîtasyonê dikî. Tu dikarî li ser vê yekê ji navendek şêwirmendiyê bêtir agahî bistînî.

# Xizmetên rehabîlîtasyonê bijîşkî

Kesên bi nexweşiyên kronîk an jî kesên astengdar xwedî mafê xizmetên rehabîlîtasyonê yên bijîjkî ne. Xizmet di nav xwe de tedbîrên ji bo parastin an baştirkirina tenduristiya we vedihewîne. Rehabîlîtasyona bijîjkî, wekî mînak, dermankirinên bijîjkî, derman û bend, piştgiriya pêşwext ji bo zarokên astengdar, alavên alîkarî û alavên çareseriyê dihewîne.

## Kî alîkariyê distîne?

- Penaberên naskirî, yên xwedî mafê penaberiyê û mafê parastina pêvek
- Kesên xwedî destûra rûniştinê li gorî xala 24-ê ya qanûna rûniştinê
- Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê ku ji bo 36 mehan li Almanyayê ne, dikarin alîkariyên entegrasyonê wekî xizmetên bijartî bistînin.

**Nîşe**

Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê ku hê jî 36 meh nîne li Almanyayê ne, mafê wan ê xizmetên rehabîlîtasyonê yên bijîjkî yê nîne. Hebûna xizmetên rehabîlîtasyonê bijîjkî dikare di rewşên takekesî de were pejirandin heke ew ji hêla bijîşkî ve hewce ne an jî beşdarî dabînkirina tenduristiyê bibin.

## Li ku derê dikarim serlêdanê tije bikim?

- Nivîsgeha refaha civakî: Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê
- Bîmeya tenduristiyê: penaberên naskirî, yên xwedî mafê penaberiyê û mafê parastina pêvek û kesên xwedî destûra rûniştinê li gorî xala 24 ya qanûna rûniştinê

## Divê ez kîjan şert û mercan bicih bînim?

- Jiyana te ya rojane ji ber nexweşiyek an astengdariyek sînordar e.
- Pîvan ji ber sedemên bijîjkî pêwîst e.
- Pêdivî ye ku tedbîr ji hêla dixtor ve were destnîşankirin û ji hêla pêşkêşkerê xizmetê ve were pejirandin.

Ji bo serîlêdana berjewendiyê, bi nivîsgeha refaha civakî an bi şirketa xweya bîmeya tenduristiyê ya yasayî re têkilî daynin. Lêbelê, her gav pêşî herin navendek şêwirmendiyê û piştgirî bistînin.





# Alavên Alîkariyê

Alavên alîkariyê, ew tiştên ku alîkariya kesên astengdar dikin ku bi jiyana xwe ya rojane re mijûl bibin. Di nav van de kursiyên bi teker/çerxekursî, amûrên bihîstinê, protez, alîkariyên dîtbarî û amûrên rêveçûne hene.

## Kî alîkariyê distîne?

- Penaberên naskirî, yên xwedî mafê penaberiyê û mafê parastina pêvek
- Kesên xwedî destûra rûniştinê li gorî xala 24-ê ya qanûna rûniştinê
- Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê ku ji bo 36 mehan e li Almanyayê dijîn, dikarin alîkariyên entegrasyonê wekî xizmetên bijartî bistînin.

**Nîşe**

Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê ku hê jî 36 meh nîne li Almanyayê ne, heke ji aliyê bijîjkî ve pêwîst be yan jî alîkarî ji bo misogerkirina tenduristiyê hebe, mafê wan ê alavên alîkariyên bijîjkî hene.

## Li ku derê dikarim serlêdanê tije bikim?

- Nivîsgeha refaha civakî: Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê
- Bîmeya tenduristiyê: penaberên naskirî, yên xwedî mafê penaberiyê û mafê parastina pêvek û kesên xwedî destûra rûniştinê li gorî xala 24 ya qanûna rûniştinê

## Divê ez kîjan şert û mercan bicih bînim?

- Di çalakiyên xwe yên rojane de tu pêdivî bi piştgirî heye.

**Girîng e:** Pêwîste penaxwaz û kesên li wan ku xwedî Duldungê ne, pêşî bi nivîsgeha refaha civakî re têkilî daynin û alîkarî li wir bê pejirandin. Tenê wê demê nivîsgeha refaha civakî dê mesrefên alîkariyan bigire ser xwe. Penaberên naskirî, yên xwedî mafê penaberiyê û mafê wan ê parastina pêvek heye û kesên ku li gorî xala 24-ê ya qanûna niştecihbûnê xwediyê destûra rûniştinê ne, di bin bîmeya tenduristiyê de ne. Hûn dikarin bi dixtor re têkilî daynin. Di pratîkê de hûn ê ji bo alîkariyê, reçeteyekê bistînin. Heke hûn bixwazin ku ji bo alîkariyê ji hêla şirketa bîmeya tenduristiyê ve were dayîn, divê hûn kontrol bikin ka şirketa bîmeya tenduristiyê pêdivî ye ku alîkariyê pesend bike.

# Alîkariya Koran

Kesên xwedî astengiya dîtinê û kesên kor xwedî mafê alîkariya koran in. Alîkariya koran xizmeta darayî ye ji bo wê yekê ku mirov di jiyana rojane de kêmasiyên wan hene û bi giştî lêçûnên darayî yên wan zêdetir in. Alîkariya koran piştgiriya darayî ya mehane ye. Ev ne girêdayiya temen, dahat û hebûnê ne. Dibe ku ew wekî dahata ji bo alîkariyên din ên civakî neyê hesibandin. Alîkariya koran xizmetek e ku ji aliyê dewletên federal ve tê dayîn. Rêzikname li gorî eyaletan diguhere.

## Kî alîkariyê distîne?

- Penaberên naskirî, yên xwedî mafê penaberiyê û mafê parastina pêvek
- Kesên xwedî destûra rûniştinê li gorî xala 24-ê ya qanûna rûniştinê
- Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê ku ji bo 36 mehan e li Almanyayê dijîn.

**Nîşe**

Penaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê ku hê jî 36 meh nîne li Almanyayê ne, mafê alîkariya koran nîne.

## Li ku derê dikarim serlêdanê tije bikim?

- Nivîsgeha refaha civakî eji bo pnaxwaz û kesên xwedî destûra Duldungê ku ji bo 36 mehan e li Almanyayê dijîn.
- Ofîsa teqawîdan ji bo penaberên naskirî, yên ku mafê penaberiyê û yên ku mafê parastina pêvek hene û kesên xwedî destûra rûniştinê li gorî xala 24 ya qanûna rûniştinê

## Divê ez kîjan şert û mercan bicih bînim?

- Pêdiviya te bi delîlan heye ku tu kor î.

Em pêşniyar dikin ku tu pêşî ji rayedar û navendek şêwirmendiyê li ser serlêdana alîkariya koran agahdarî bistînî. Hingê tu dikarî serîlêdanê bişînî.

Di **Rêzenivîsa Agahiyan ji bo penaberên astengdar û xizmen wan de** ev tişt hate weşandin:




Pêngavên yekem piştî gihîştina Almaniyayê – Agahiyên li ser xalên herî girîng ên têkiliyê piştî gihîştina Almanyayê




Sîstema piştevaniyê ji bo astengdaran – Agahiyan li ser berjewendiyên tevlêbûnê, Alîkariyên civakî li hember berjewendiyên tevlêbûnê, serlêdan ji bo alîkariyên bi alavan, naskirina astengdariyê




Tenduristî, rehabîlîtatsyon û lenihêrînê – agahiyên bikêrhatî li ser mafê lênerîna bijîşkî, rehabîlîtasyon û lênêrînê û li ser sîstema bîmeya tenduristiyêssen




Sîstema piştevaniyê ji bo endamên malbatên xwedî zarokên astengdar – Agahiyan li ser mafê perwerdeya dibistanê, xizmetên hemşîretî û lênêrînê




Tevlêbûna Civakî û Kursa Ziman – Kîjan servîs tevlêbûna we ya jiyanê li Almanyayê xurt dike? Agahiyên li ser kursên entegrasyonê, rûniştina ji bo kesên astengdar û alîkariyê




Serlêdana berjewendiyan û sitandina alîkariyan – her tiştê ku divê tu di derbarê xizmetên herî girîng yên piştgiriya dewletê bizanibî û çawa ji bo piştevaniyê serlêdana pêşkêş bikî

# Em („wir“) kî ne?

Em ê projeya „Empowerment Now“ ya rêxistina Handicup International û xweparêzên ji „NOW! Nicht Ohne das Wir“ ne. Em soz didin ku ji bo penaberên astengdar û xizmên wan gihandina agahiyan hêsantir bikin. Endamên koma „NOW! Nicht Ohne das Wir“ dizanin ku li Almanyayê wergirtina piştgirî û alîkariyê çiqas zehmet e. Ji ber vê yekê dixwazin zanebûna xwe derbas bikin.

# Di derbarê komê NOW! Nicht Ohne das Wir:

„NOW! Nicht Ohne das Wir“ xwe temsîlkirina penaberên astengdar e. Em bi xwe penaber in û astengdariyeke me heye. Ji dema hatina me ya Almanyayê ve em bi astengiyan re rû bi rû man. Lê di koma xwe de em têgihiştin û hevgirtinê dibînin. Em hevûdu xurt dikin û ji bo civakek berfireh em bi hev re dixebitin. Em soz didin ku penaberên astengdar û malbatên wan li Almanyayê baştir bijîn. Koma Xweparêzerê „NOW! Nicht Ohne das Wir“ ji hêla Handicup International ve wekî beşek ji projeya „Empowerment Now“ tê piştgirîkirin.



© Rendel Freude

handicap international
humanity & inclusion

# Di derbarê projeya „Empowerment Now“

Bi rêya “Empowerment Now” Handicap International piştgirî dide xweparastina penaberên astengdar û xizmên wan. Bi hev re li gel koma “NOW! “Nicht Ohne das Wir” em ji bo maf û berjewendiyên penaberên astengdar dixebitin. Em soz didin ku fikar û nîgeraniyên penaberên astengdar bi awayekî sîstematîk li ber çavan werin girtin - ji rûniştinê heta gihîştina kursên ziman ên bêasteng ji bo tevlîkirina li bazara karê.

Projeya Empowerment Now ji hêla:

UNO Flüchtlingshilfe Deutschland für den UNHCR

Die Beauftragte der Bundesregierung für Migration, Flüchtlinge und Integration
Die Beauftragte der Bundesregierung für Antirassismus